Ronahî
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 936 26-Çille - 2022 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
@rojnameyaronahî
+963 052 423165
423165
+963 938541707
الوكيل الحصري للتوزيع
شركة الشمال
shrktronahi@gmail.com
0998723906
المكتب الرئيسي: قامشلو - دوار سوني

# Azadiya huner û weşanê biparêzin

**Ser 100î re sazî û rêxistinên çand û agahiyan diafirînin, li dijî qedexekirina Weşanxaneya Mezopotamya û şirketa mûzîkê MÎR Multimediayê bi sernavê “Azadiya huner û weşanê biparêzin” daxuyaniyeke piştgiriyê belav kirin.**



Sedema vê daxuyaniyê jî ew e ku hefteya, 26´ê Çileyê 2022´yan doza Weşanxaneya Mezopotamya û şirketa muzîkê MÎR Multimediayê li dijî qedexeya bi biryara wezareta karê hundir a federal wê li Leipzîgê dest pê bike.

Şîara vê piştgiriyê bi giştî wiha ye: “Li dijî sansura siyasî û bertengkirina azadiya weşanê û pirrengiya çandî - ji bo betalkirina qedexekirina Weşanxaneya Mezopotamya û şirketa muzîkê MÎR Multimediayê”.

Di nava îmzekerên metnê de endamekî Rêveberiya Navenda PENa Elmanyayê, du endamên Rêveberiya Federal a Yekîtiya Nivîskarên Elman jî hene.

Weşanxaneya Mezopotamya û şirketa muzîkê MÎR Multimediayê sala 2019´an bi biryara Wezareta Karê Hundir a Federal a Elmanyayê ve, li gorî qanûna komeleyan hatin girtin. Wezaretê ew weke rêxistinên ser bi PKK ya qedexekirî nîşan dabûn.

Di metnê de tê bi bîrxistin ku di çarçoveya doza qedexekirinê de bi hezaran kitêbên qedexenekirî, gelek qeydiyên dengan, teknîka deng û arşîva herî mezin a muzîka Kurdî ya li dinyayê hatine desteserkirin. Ew vê arşîvê weke xezîneyeke çandî ya dinyayê bi nav dikin û dibêjin, ev xezîne edî li xelkê girtiye û di destê rêxistina îstîxbarata Elman de ye.

Zilma xwe bi dawî bikin

Di metnê de tê gotin, “Mirov rabe ji xwe re karên terorîstî li hev bîne û bixe stûyê weşanxaneyekê û şirketeke muzîkê, ev destwerdaneke hişk û çor e li dijî mafên sereke yên demokratîk ên weke azadiya huner, fikr, çapemeniyê û weşanê.”

Îmzaker vê bangê dikin: “Em bang dikin da ku qedexekirina herdu saziyên medyayê bê betalkirin, materyalên desteserkirî li xwediyên wan bên vegerandin da ku ew saziyên medyayê xebatên xwe ji nû ve dewam bikin.

Em her wiha daxwaz dikin ku Hikûmeta Federal û dewleta Tirk zilma xwe li dijî mirovên Kurd û çanda wan jî bi dawî bikin”.

***Ozgûr Polîtîka***

# Welatiyên Helebce li ser berfê xwarinê ji balindeyan re datînin



Li sînorê Helepce û Hewraman nêzî 40 santîm berf barî, hemwelatî bi barîna berfê gelek keyfxweş bûn û hemû derketin nava berfê. Li gel kêfxweşiya berfê welatiyan erkê xwe yê jîngeparêziyê jî bi cîh anîn û balindeyên xwarina wan dibin berfê de mayî bê xwarin nehêlan. Bi pêşengiya Seroka şaredariya Helepce Kwêstan Ekrem welatiyan li derdorê xwarin ji bo balindeyan danîn.

Helepçe- Bi barîna befir û zêdebûna sermayê hemwelatî li bajar û bajarokên Kurdistanê bi awayek xwebexşane xwarin ji bo ajalan belav kirin. Çalakvan û jingehparêz daxwaz dikin ku hemû bejdarî kampanya bibin û erkê parastina ajalan bigrin ser milê xwe. Bi destpêkirina şilopeya barîna berfê re xwarinên balinde û ajalan di minin bin berfê de û ew birçî dimînin. Welatiyên Helepçe weke berpirsyartiya xwe dibînin û li cihên giştî xwarinan didanin da ku balinde û ajal birsî nemînin. Seroka şaredariya Helepçe Kuwêstan Ekrem li gel komek xwebexweş kampanya ji bo xwarindayîna balinde û ajalan dane destpêkirin. Kom genim dibin di danin cihên giştî ber balindeyan da ku balinde namînin birçî.

**“Parastina balindeyan erkê me hemûyane”**

Kuwêstan Ekrem behsa rewşa balinde û ajalan di dema barîna berfê de kir û got: “Qederek befir bariye. Weke seroka şaredariyê em bi erk û berpirsiyariya xwe rabûn û me cede û cihên giştî paqij kir. Ji bo balinde bê xwarin nemîne ew cihên me paqij kirî me xwarin ji bo balindayan di danî, ji ber me bi çavê xwe didît gelek balinde dit ku bê xwarin bû. Min xwest pêwîstiyên wan balindeyan bi cih bînim ji bo wê me genim anî li cihên giştî yên Helepçe ku gelek balinde lêne belav kir. Balinde û ajal beşek ji temamkarên jingehê ne, divê em xwarin bidin wan û ji sermaya zivîstanê bi parêzin.”

# QUNCIKA TÊGÎNAN

| | |
|---|---|
| Abone (Fransî) | 1.Kesê ji bo demekê rojname, kovar û hwed. dikire û pereyên wan pêşî dide: Ez aboneyê rojnameya Ronahî me. 2.Kesê çûna ciyekî ji xwe re kirî edet |
| Alternatîf (Fransî) | 1.Bedîl: Ku tu bi min re neyî jî alternatîfa min heye. 2.Cuda. 3.Dijber |
| Amanc | Kêlika ji bo ceribandina sekvaniyê tê vedan, yan ciyê ji bo vî karî tê diyarkirin û guleyan berdidinê. |
| Armanc | Tişta mirov dixwaze bi dest bixe, yan xwe bigihîniyê. Hedef, mebest, meram, mexsed, daxwazî, doz: Armanca me azadiya Kurdistanê ye |
| Dosya (Fransî) | 1.Agahî û belgeyên li ser heman mijarê, heman kesî û heman karî. 2. Qapê ji kartonan çêbûyî yê belgeyên bi vî rengî tê de kom bûyîn. |
| Pêşbînî. | Texmîna li ser paşrojê; baweriya bi bûyerên ku wê di demên pêş de biqewimin: Li ser paşroja Kurdistanê pêşbîniya te çi ye? |
| Pratîk (Fransî) | 1.Tiştên bi hêsanî pêk tên; tiştên bikeys. 2.Kesê ji pirsgirkan re bilez û bi hêsanî çareyan dibîne: Mirovekî pratîk e. |
| Qonax. | 1.Serdem, merhele, gihanek, pêvajo. 2.Dûrayiya ji derekê, mesafe, qeder. 3. Xan, qesir, saray, avayî |
| Yekser | Rastûrast, rêûrast, yekderb, rast, bênavber, bê ku biçe ciyekî din |
| Yekcar. | Ji binî, hîç, bi ti awayî, |

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | A | ■ | R | A | ■ | A | Z | A | D |
| 2 | R | E | ■ | F | E | ■ | O | J | E |
| 3 | D | ■ | X | E | ■ | Î | ■ | O | ■ |
| 4 | ■ | J | ■ | T | E | Ş | Î | ■ | E |
| 5 | K | Ê | L | ■ | L | ■ | S | R | Y |
| 6 | I | ■ | A | T | Î | N | A | ■ | A |
| 7 | Ş | O | P | ■ | F | A | ■ | A | R |
| 8 | ■ | D | A | N | ■ | N | A | L | ■ |
| 9 | X | E | Z | A | L | ■ | D | A | D |

## Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | ■ | | ■ | | | ■ | |
| 2 | | ■ | | | | | ■ | | |
| 3 | | | | ■ | | ■ | | | ■ |
| 4 | | | | | | | ■ | | ■ |
| 5 | | | ■ | | ■ | | | | |
| 6 | ■ | | | | | | | ■ | |
| 7 | | ■ | | ■ | | | ■ | | |
| 8 | | | | | | ■ | | | ■ |
| 9 | | ■ | | | ■ | | | | |

### ÇEP-RAST

1. Ji bo bûkê, birayê zavê... Pirç
2. Tiştên ku ji nifşên berê hatine wergirtin... Hejmarên du, çar, şeş, heşt û hwd.
3. Kevir... Notayek
4. Paytexta Tirkiyeyê
5. Cînava pirsiyariyê ya ku tê wateya; li kû ye?... Berxikên 1-3 hefteyî
6. Alava ku ji derbên şûra parastin pê tê kirin
7. Cejin, eyd... Sendîkaya Karkeran a Swêdê
8. Kesê ku diçe serdanê... Kurteya ajansa fermî ya Tirkiyeyê
9. Kar û xebat... Dengê ku ji tiştê dikeve avê dertê

### JOR-JÊR

1. Cureyekî nexweşiya lingên pez ... Beşeke malê, jûr
2. Sûreyeke Quranê
3. Plakaya navneteweyî ya Iraqê... (Derwêşê ...) Destaneke me
4. Plakaya navneteweyî ya Tirkiyeyê... Mija ku li asîman berî baranê komî ser hev dibe û jê baran dibare... Cihê heranê
5. Dijbera germ... Şivika darîn a zirav a ku serî tûj e û bi kevan tê avêtin
6. Notayek... Ji bo firehî, dirêjî û kûrahiya tiştekî
7. Eşîr, qebîle, hoz...Tîpên navî yên “saet”ê
8. Gemara heywanên bibask...Bêzar û bêziman
9. Baneşana ku pê ga tê ajotin û sekinandin... Roja em tê de ne

# Dagîrkeran hê serkeftina Kobanê û şkestina DAIŞ`ê qebûl nekirine

Kobanê berxwedana li hemberî DAIŞ’ê, ji çarçoveya bajarekî derxist û ji bo gelê Kurd bû rûmet û hebûn. Dewleta tirkî ya dagîrker jî bi êrişên bênavber dixwaze DAIŞ’ê jinûve zindî bike, vîna gelên herêmê û pergala Netewya Demokartîk bişkîne. ***R-3***



Ronahî
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 936 26-Çille - 2022 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

## `Wê felsefeya Rêber Apo me azad bike `

Rewda Hesen diyer kir ku piştî şoreşa Rojava jinên Kurd herwiha yên herêmê bi saya tevgera felsefeya azadiyê, têkoşîna azadiya xwe pir pêş xistin û azadiya jinê di cîhanê de kirin rojeva sereke. ***R-2***




# BİRYARA ÊRİŞA DAIŞ’Ê Lİ ENQERE HATIYE DAYÎN

20ê mehê çeteyên DAIŞ’ê bi planeke rêxistinkirî êrişî girtîgeha Sînaa ya li Hesekê kir. Hemwextî van êrişan dewleta tirkî ya dagîrker jî êrişî Şingal, Ti Temir û Eyn Îsa kir. Bi vê hewldana dewleta tirkî ya faşîst careke din diyar bû ku bi çeteyên DAIŞ’ê re ye û dixwaze tola têkbirina DAIŞ’ê bi qirkirinekê din rake.



## `Li pişt êrişa DAIŞ`ê Tirkiye heye`

Ferhan Dawid: Dewleta tirkî nikarî bi êrişan hêza me bişkîne. Ji bo wê dixwaze DAIŞ’ê jinûve zindî bike û bi destê çeteyan gel qir bike. Amerîka û Rûsya jî qaşo ji bo şerê DAIŞ’ê hatine bakur û rojhilatê Sûriyê, lê mixabin heta niha erkê xwe pêk neanîne û li dû berjewendiyên xwe ne. ***R-5***



## ‘Rejima Sûriyê bi gotinên şovenîst û bêaqilî êrişî hêzên li dijî DAIŞ’ê şer dikin, dike’

Daîreya Têkiliyên Derve ya Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê bersiva daxuyaniyên hikumeta Şamê yên têkildarî bûyerên dawî yên li Hesekê da: Daxuyaniyên wezareta rejîmê û Fesysel Miqdad, şovenist û pêkenok in. ***R-3***



## Ruhê berxwedan û serkeftina Kobanê afirandîn kirin film

Diyar Heso: Ruhê serkeftina Kobanê afirandî rastî ye û ya diket ser milê me jî ew bû ku em vê rastiyê raxin ber çavê her kesî. ***R-7***

## Qedexeya 7 rojan ya giştî li ser Hesekê hat ragihandin

Desteya Hundir ya Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê qedexeya 7 rojan ya giştî li ser kantona Hesekê û ya qismî li herêmên din yên rêveberiyê ragihand. ***R-3***

## Çalakiya konvedanê ya li ber deriyê Sêmalka hat bidawîkirin



Çalakiya Konvedanê ya ji aliyê Malbatên şehîdan ve li ber deriyê Sêîmalka hatî lidarxistin, hat bidawîkirin. Lê ji bo giritina cenazeyên şehîdan û piştgiriya berxwedana gerîla wê çalakiyên bi şêwazên cuda werin lidarxistin. ***R-3***

## Gelên bindest bi saya keda şehîdên xwe bûn xwedînasname



Dayîka Mihemed: Bila keyfa dijmin bi şehîdbûna ciwanên Kurd xweş nebe, heta mirinê wê tiliya me di çavê wan de be û emê di şopa şêhîdên xwe de bihêztir têkoşînê bikin. ***R-6***

# `Wê felsefeya Rêber Apo me azad bike `

Rewda Hesen diyer kir ku piştî şoreşa Rojava jinên Kurd herwiha yên herêmê bi saya tevgera felsefeya azadiyê, têkoşîna azadiya xwe pir pêş xistin û azadiya jinê di cîhanê de kirin rojeva sereke.

**Dilîn Ehmed-Ronahî**



Hevseroka desteya çandê ye herêma Cizîrê Rewda Hesan li ser têkoşîna azadiya jinê ya li bakur û rojhilatê Sûrî û girêdana serkeftina vê tekoşinê bi sîstema Rêber Apo ya Neteweya Demokratîk re ji me re axivî.

Rewda got, deshilata zilam bi navê ol, exlaq û kevneşopiya paşverû ya civakê mafê jinan binpê kirine. Rewda axaftina xwe wiha domand: "Eger em binirxînin ji despêka Şoreşa Rojava ve bi giştî jin, taybet jî jinên kurd xwedî cihek taybet û biriyar bûn. Di her aliyê civakê de cihê xwe digirt, lê mixabin desthilata zilam bi kemin û qurnazêyan, bi hiceta ol tiştên ku di civakêde rola jinê daxîne, jin kir armanç. Herwiha piştî deshilata dewletan û sîstema deshilad ya kapitalist jin di civakê de kiribû amûrekî herî qîmet keftî. Jinên kurd jî para xwe ji vê yekê girt. Lê piştî tekoşîna Rêber Apo despêkirî û li ser ramanên wî tekoşîna azadiya jinê despêkirî rewş hat guhartin. Li ser heman Ramana şoreşa Rojava despê kir û ew derfet hat dayin ku jin ji nûve bibe xwedî îrade û ew çanda wekheviyê vegerîne. Li ser vê yekê jin bû sembola azadiyê û di hemu qadadên civakê bû xwedî rola herî girîng. Ev jî bi saya perwerdeya li ser fikir û felsefeya Rêber Apo çêbû, bingehê vê qedê û serkeftinê wî hûnandibû ."

## `Jin bila ji hêza xwe bawer bin`

Rewda got, jin tevayî xwedî hêzin û dikare di rêyaperverdeyên xweser de fêr bibe ka wê çawa vê hezê derxîne û mafê xwe biparêze. Lewra ev perwerde mirov fêrî gelek rê û rêbazên xweparastinê dike. Rewda bal kişan ser xweparastina jin û axaftina xwe wiha domand: "Pêwîste jin xwe nas bike, ji bo azadiya xwe tekoşîn bike û li her cihî xweseriya xwe ava bike. Divê em bi tekojîn û berxwedana xwe hemû jinan azad bikin û divê em jin ji milê aborî de jî bikaribin serxwebûna xwe ava bikin û ji her alî ve xwe perverde bikin."

Rewda diyar kir ku raman û fikrên Rêber Apo li her cihîne û ew rêya azadiya xwe di fikrê Rêber Apo de dibînin û axiftina xwe wiha domand: "Raste Rêber Apo di bin tecrîda fizîkî deye, lê em derfetê nadin dijmin ku me dûrî fikir û ramanên rêbertiyê me bike. Di riya xwendina pirtuk û pespektîfên Rêber Apo de, em fikir û felsefeya wî ya azad di nav civakê de zindî dikin. Lewra em ji perwerde û lîkolînên rêbertiya xwe sud werdigrin û di ramanên wî de azadiya xwe dibînin."

## `Ne jinên Kurd tenê hemû jinên cîhanê azadiya xwe di sîstema Rêber Apo dibînin `

Rewda Hesan axaftina xwe wiha domand: "Di rizgarkirna herêmê de gelê Ereb pir jinê Ereb û Suriyan bi fikr û felsefeya rêber Apo bandor bûn. Herwiha ne tenê jinê bakur û rojhilatê Sûriyê, pir jinên walatên derve pirtûkên rêbertî xwendin û pê bandor bûn. Ev yek tê wateya ku Rêber Apo bingehek pir bi hêz ji jnan re ava kiriye. Bi ramanên rêbertiyê, jina kurd jî bû mînak û semola jinên cîhanê. Bi taybetî jina leşker ya ku ji bo azadiya gelê xwe canê xwe feda kir bû sembola dîroka jinê."

Hevseroka desteya çandê ye herêma Cizîrê, li ser çûna xwe ya dewleta Îspaniya axaftina xwe bi dawî kir: "Beriya demekê dewleta Îspaniya em dawetî walatê xwe kirin. Li wê derê me gelek civîn li dar xistin, bi taybetî li ser mijarê jinan. Tişta ku li wê derê bala min dikişand ew bû ku, jinên wan pir bi sîstem û hêza jinên Rojava bandor bibûn. Digotin `reste em dewleteke paşketîne, lê sîsema Rojava ji dewletên paşketî bêtir mafê her kesî dide`. Ji bo wê banga min ji hemû jinan re ew ku, li keda Rêber Apo xwedî derkevin û xwe pêş bixe, têkoşîn bike û destkeftiyên di destê xwe de biparêzin, da ku em bikarin hemû jinên bindest azad bikin. Rêber Apo jî dibêje, 'Eger jin azad nebe ti civak jî azad nabin'."

# ''Em rê nadin fermanên nû'

**Jinên Şingalê li dijî hewldanên Pêkanîna Peymana 9'ê Cotmehê nerazibûna xwe anin ziman û gotin, hikumeta Kazimî dixwaze ewleyiya civakê xirab bike lê em rê nadin ku Asayiş, sazî û dezgehên me tine bikin."**

Dayê Şemê diyar kir ku tevgera leşkerên hikumeta Kazimî ya di nava gund û bajêrên Şingalê de ji Peymana 9'ê Cotmehê ne dûr e û wiha got: " Hatina leşkerên artêşa Kazimî bi peymana 9'ê Cotmehê ve girêdayiye. Rewşa Şingalê aram e lê bi hatina cêş ve aramiya Şingalê têk dibin û bi van kiryayan rê li fermanê re vedikin. Divê tevahî mezin û mîrên Êzidiyan bêdeng nemînin û ji hikûmeta Iraqê re bêjin bê ka bi çi sedemê bi sedan leşkerên xwe li Şingalê bicih kirine gelo hatine şer bikin? Artêşa hukûmeta Kadimî ji bo ku xwe li her devera Şingalê de bi cih bike ji gel re dibêjin 'em ji bo parastina wek hatine.' Lê gel rastiya wan dizane û li gorê wê tev digere.

Ji ber tevgerîna zêde ya artêşa Iraqê ya di nava gund û bajarên Şingalê de di 17'ê mehê de tirimbêlek ya xwendekaran qeza kir û di encamê de 2 ciwanan jiyana xwe ji destdan û 27 kes jî birindar bûn. Dayê Şemê ew bûyer jî bivan gotinan nirxand: " Tevahî cihanê dît di 17'ê mehê de rexmê ku bûbûn sedema qezaya seyareya xwendekarên me car din jî di tirimbêlên xwe de dilan û şahî dikirin gelo yên vê yekê bikin ji bo tunekirina me hatine yan ji bo parastina me? Em tev listokên li ser Şengalê dizanin. Divê em rê nedin van listikan divê em li dijî van êrişan rawestin û rê ji fermanê re bigirin."

Dayê Şemê di dawiya gotinên xwe de armanca peymana 9'ê cotmehê ya sala 2020'an jî nirxand û wiha got: "Herkes tifaqa nava hikûmeta Kadimî PDK'ê û dewleta Tirkiyê dizane ji xwe ve tifaqa ji bo 9'ê cotmehê ji bo gelê Êzidî avakirin lê dema em li kiryarên hikûmeta Kadimî û artêşa wê dibînin em digihin wê encamê ku ev tifak pêkanina fermaneke nûye. Ger hikûmeta Kadimî xêra civaka Êzidî dixaze bila her roj rojnamevan û ciwanên me bê sedem negire li ser Şehîdên me dilan nekin û li cihê ciwanên me bigirin bila DAIŞ'î yên ferman bi ser mede anîn darizînin."

Endama Tevgera Azadiya Jinên Êzîdî (TAJÊ) Nûrê Şingalî li ser kiryarên hikûmeta Kadimî bertekên xwe bi van gotinana anî ziman: "Hikûmeta Kadimî jî weke dewleta Tirk êrişê Civaka Êzidî dike. Her roj bi hecetekê tenê ji bo asayiş û hêzên Êzidxanê yên ku ewlehiya civaka xwe dikin tune bikin zextê li gel dikin em weke jinên Şengalê van kirina şermezar dikin û em wê tucar rênedin peyman û planên dijmin. Di salvegera Şehît Zerdeş de jî me xwest ku em peykerê wî li navenda Şengalê deynin lê nehiştin ev tev dide diyar kirin ku ji bo doman dina peymanê gavên nune em jî weke gelê Şengalê em ê ti carî rê ji van listokan re venekin, em xweş dizanin ku dixwazin vîna civakê tune bikin lê em rênadin wan."

***ANF***





## Ev êriş nîşana qelsbûn û têkçûna wan e

**Aysel AVESTA**



Van rojên dawî liv û tevgera şaneyên veşartî yên çeteyên DAIŞ'ê li Rojavayê Kurdistanê zêde bûye. Dewleta tirk a dagirker jî bê navber bi balafirên bi çek ên bê mirov êrişî Şengalê dike. Piştî ku çeteyên DAIŞ'ê li Şengal û Rojava ji hêla çekdarî ve têkçûn pîlan û hesabên Dewleta Tirk û hevkarên wê ser û binî hev bûn. Berovajî pîlanên wan Rêveberiya Xweser a Şengalê saziyên xwe yên xweser avakirin û gel bi vîn û îradeya xwe, xwe bi rê ve dibe.

Dewleta Tirk a qirker ku tehemûlî vê îradeyê nake, bi piştgiriya Hikûmeta Iraqê û PDK'ê, dest bi pîlaneke nû kir.

Di roja salvegera komploya navdewletî de ango 9'ê Cotmeha 2020' an de peymanek îmze kir. Di serî de civaka Êzîdî, gelê Kurd ev peyman weke dewama fermana 74´an pênase kir û bi berxwedanê bersiv da nêyarên koka xwe. Ji bo pêşî li vê helwêsta gel bigirin û wan çavtirsandî bikin, rojane êriş dikin. Lê vê civaka ku bi sedan ji van ewrên reş di ser xwe re bihurandine, natirse, hebûna xwe diparêze û dev jî axa xwe bernade.

Li aliyê din şaneyên veşartî yên DAIŞ'ê şeva 21'ê Çile, li Hesekê bi rêya erebeyên bombebarkirî li ser hev gelek teqîn pêk anîn. Bi van teqînan êrişî girtîgeha Xiwêran kirin, da ku çeteyên DAIŞ'ê yên di girtîgehê de birevînin û piştre ji nû ve xeterekê li ser mirovahiyê çêkin, aloziyê belav bikin û tirsê bixin nava dilê pêkhateyên herêmê. Balkêş e, ev êriş di dema salvegera dagirkirina Efrînê de ketin rojeve. Ji van êrişan jî diyar e ku dewleta Tirk gelekî tengav bûye û li ber têkçûnê ye. Ji bo xwe bi hêz nîşand bide û ser vê têkçûna xwe bigire, ji destpêka sala 2021´ê ve bi teknîk û hêza xwe hemûyî êrişî herêmên Parastina Medyayê kir û ev êriş hê jî didomin.

Dewleta Tirk di van êrişan de her rêbaza qirêj xist dewrê û qanûnên navneteweyî binpê kirin û wan hîna jî binpê dike. Lê tevî vê yekê jî bi ser neket û li hemberî berxwedana gerîlayên azadiyê, îtîbara xwe roj bi roj winda dike. Ji ber ku dahata welêt hemû di xizmeta vî şerê qirêj de ye, qeyrana aborî, siyasî û civakî her ku diçe kurtir dibe. Gel li ber birçîbûnê ye.

Bi hezaran girtiyên siyasî yên dîlgirtî, di bin zext û êşkencê de ne. Girtiyên nexweş nayên dermankirin û yên cezayên wan qediyane, nayên berdan. A rast, ev rewş nîşaneya qelsbûn û xitimandina desthilata AKP-MHP'ê diyar dike.

Dewleta Tirk a ku ji hêla AKP-MHP'ê ve tê birêvebirin, ji roja destpêkê ve bi awayekî fermî piştevaniya çeteyên DAIŞ'ê dike. Ne tenê destekê dide DAIŞ'ê, her wiha wê fînanse dike û bi rê ve jî dibe. Careke din çarenûs û mayîna xwe bi çeteyan ve girê dide da ku temenê desthilata xwe dirêj bike. Bi vê armancê êrişên xwe li dijî vîna gelên herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û Şengalê zêde kirine.

Jixwe, rojane li deverên dagirkirî yên weke Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî sûcên şer dike. Xwezayê talan dike, sivîlan direvîne, kuştin, destdirêjî û şideta li dijî jinê, bûne mijarên rûtîn ên rojevê. Lê di salvegera êrişên dagirkeriyê yên li dijî Efrînê de jî diyar bû ku xelkê herêmê rûxmê êrişan hemûyan jî berxwedana xwe dewam dike û bi berdêlên giran xaka xwe diparêze. Di serî de rêxistinên jinan, gelê Kurd û dostên xwe li hemberî her cûreyê êrişam têkoşînê geş dikin.

***Yenî Ozgûr Polîtîka***



# Ruhê berxwedan û serkeftina Kobanê afirandîn kirin film

Diyar Heso: Ruhê serkeftina Kobanê afirandî rastî ye û ya diket ser milê me jî ew bû ku em vê rastiyê raxin ber çavê her kesî.

**Mihemed Xanim-Qamişlo**



Çeteyên DAIŞ'ê sala 2014'an bi armanca têkbirina destkeftiyên gelê Kurd, bi piştgiriya dewletên weke Tirkiyê êrişî bajarê Kobanê kirin. Çeteyên ku qet para xwe ji mirovahiyê negirtine bi hemû hovîtî û qirêjiyên xwe êrîşî Kobanê kirin û hêvî dikirin ku di demekî kurt de bigêhêjin armancên xwe. Lê belê ji ber ku gelê Kobanê bi fikir û ramanê azad xwe perwerde kirine. Keç û xortên bajarê Kobanê li hember hovîtiya çeteyên DAIŞê bi vînek mezin li ber xwe dan û tekoşîn kirin. Di Kobanê de careke din yekbûna gelê Kurd pê khat û di heman demê de hestê mirovahiyê li hember hêzên tarî û dagirker bûn yek. Gelê Kurd li çar parçeyên Kurdistanê ji bo Kobanê rabû ser piyan û bi yek dilî bi şervanên YPJ'ê û YPG'ê re milbimil, ji bo biratiya gelan destanên qehremaniyê nivîsandin.

Li ser destan û efseneyên Berxwedana Kobanê, komîna film ya Rojava di destpêka sala 2021'an de dest bi çêkirina filmê bi navê 'Berxwedana Kobanê' kir û çêkirina dîmenên wê şeş mehan dirêj kir. Ji bo zanyariyên zêdetir li ser filmê 'Berxwedana Kobanê' çêker û alîkarê derhênerê film Diyar Heso ji me re axivî.

Hiso diyar kir ku armanca çêkirina



film zindikirina çîrokên berxwedanê û parvekirina tevaya cîhanê ye û axaftina xwe wiha domand: "Serkeftina Kobanê, serkeftina gel û nirxên mirovayiyê li hemberî tarîtiyê bû. Bi sedan çîrokên qehremaniyê li nava kolanên Kobanê pêk hatin. Ev film bersiva her pirsekê li ser berxwedana Kobanê ye. Bersiva pirsên wekî Çima Kobanê bi ser ket? Çawa van şervanan dikarîbûn ewqas li ber xwe bidin?"

Hiso bal kişand ser sedemên derengmayîna kişandina dîmenên film û wiha berdewamî da axaftina xwe: "Filmê Berxwedana Kobanê bi giştî bi dawî nebûye. Lê kêşana dîmenên film bidawî bûne. Kêşana dîmenan li bajarê Kobanê û derdora wê pêk hatin. Ji zehmetiyên ku me derbas kirin, firehbûna çîroka berxwedana Kobanê. Ji ber hebûna bisedan kolan û bi hezaran mal. Her wiha hebûna bi hezaran xelkên Kobanê, şoreşgerên Kurdiastanî û Enternasyonalîst; Enternasyonalîst ku di nava berxwedanê de cihê xwe girtibûn. Ewqas berxwedanî û bûyerên ku qewimîn, zehmete ku mirov bikaribe di filmekî dema wî sê saat de bi cih bike. Hin sedemên derengmayîna çêkirina film anîna hin amûrên teknîkê yên pêwîst ji derve yî herêmê, kişandina hin dîmenan li bajarên din ji ber hebûna dagîrkeriya tirkî û gefên wê li ser bajarê Kobanê, belavbûna nexweşiya koronan û rewşa avhewayê"

Çêker û derhênerê alîkar yê filmê berxwedana Kobanê Diyar Heso da zanîn ku piraniya lîstikvanên ku cihê xwe di film de girtine, ew kesên ku di nava berxwedana Kobanê de bûn û axaftina xwe wiha qedand: "Hîn Lîstikvanên film, di berxwedanê de cih girtîne û praniya wan cara yekeme listokvaniya filmekî dikin; Hin ji wan di dema şer de şervanbûn û di Kobanê de şer dikirin. Hin jî kesên ji Kobanê ne ku kêliyên şer jiyan kiribûn. Her wiha lîstikvan ji herêma Cizîr û Efrîn jî hebûn. Kesên Kurdistanî ne ku ev çîrok ya wane. Ew kesên ku herî zêde nêzî rastiyê ne û ew yên herî zêde dikarin van hestan derxin pêş. Derfeta me ya sereke ji bo çêkirina film, hebûna çîrokê û rastiya wê bû."



Lîstikvana filmê Berxwedana Kobanê Nejbîr Xanim diyar kir ku bextewar e ji ber beşdarbûna xwe ya di filmekî ku destanên lehengan derdixe holê û axaftina xwe wiha dewam kir : "Beşdarbûna di filmekî mîna yê Berxwedana Kobanê cihê kêfxweşiyê ye. Di vê berxwedanê de, li hemberî hovîtî û êrîşên dijmirovahiyê, bi pêşengîtiya şervanên YPJ-YPG'ê û şervanên Enternasyonalîst, bi sedan gelên demorakrasîxwaz piştgiriyek mezin nîşanî hemû hêzên dagîrker dan û tekez kirin ku vîna gelên azadîxwaz û şervanên qehraman nayê şkandin."

# Ocalan li zanîngehan ders e

**Li gorî daneyên Inîsiyatîfa Navneteweyî ya 'Ji Ocalan re Azadî', li zanîngeh û navendên akademîk yên cîhanê herwiha di bernameyên xwendinê de, pirtûkên Rêber Ocalan wek çavkanî tên bikaranîn.**




Rêber Abdullah Ocalan ku afrînerê konfederalîzma demokratîk e, gelek pirtûk nivîsandine û pirtûkên wî li qederê 20 zimanên cuda hatine wergerandin û niha li zanîngehên binavûdeng yên cîhanê wek çavkanî tên bikaranîn û di bernameya xwendinê de cih girtine.

Ji bilî vê, bi hezaran semîner û lêkolîn li ser mijarê hatine kirin.

Rêber Abdullah Ocalan broşûra xwe ya yekê sala 1975'an li gel Mehmet Hayrî Durmûş bi navê "Nirxandina derbarê împarator û kolonyalîmzê" de ji bo manifestoya "Komeleya Demokratîk a Xwendekarên Xwendina Bilind a Enqerê" nivîsand. Ev bû belgeya yekê ya nivîskî ya komeleyê. Herwiha, gotarên li bajarên Kurdistanê wan pêşkêş kirîbûn di Adara 1977'an de hatin nivîsandin.

Manifestoya PKK'ê û pirtûkên pey wê re

Di 18'ê Gulana 1977'an de Hakî Karer ji aliyê dewleta Tirkan ve hate şehîd kirin ku Rêber Ocalan weke "ruhê xwe yê veşartî" didît, ji bo bersivdayînê û bibîranîna Hakî Karer, Rêber Ocalan di payîza heman salê de "bernameya partiyê" dinivîse û sala 1978'an jî weşana partiyê Serxwebûnê çap dike. Di heman salê de yekem jimar derket û Manifestoya "Rêya Şoreşa Kurdistanê" ya Rêber Ocalan hate belavkirin.

Rêber Ocalan ji sala 1970´yî heta 1980'yî qederê 10 pirtûk û broşûrên bi navê Eniya Yekgirtina Parastin û Têkoşîna li dijî Faşîzmê, Rola Zorê li Kurdistanê, Doza Rizgariya Neteweyî, Rêya Çareseriyê, Li Kurdistanê Dahurandina Kesayetiyê, Teybetmendiyên Têkoşerên Şoreşger, derbarê rêxistin, darbeya eskerî, erk û siyasetê de nivîsandiye.

Nirxandinên Rêber Ocalan yên ji bo pirsgirêkên salên 1987 û 1990'î de bi çend pirtûkan hatine nivîsandin. Ji van, Helwêsta Şoreşgerî beramberî Pirsa Dîn, Pirsgirêka Jin û Malbatê, Tesfiyekirina tesfiyekaran, PKK, Faşîzma 12'yê Îlonê û Parastin, Li Kurdistanê Xiyanet û Parastin, Di dîroka partiyê de kesayetiya xebatkar û hilbijartekên 1.2.3.4.

'Şerê parastina hebûnê'

Rêber Ocalan rêveberiya xebata çekdarî li xwe digire û bi "Şerê Parastina Hebûnê" pênase dike. Di navbera 1990'î û 1992'yan de piştgiriya zêde ya gel bi dest xist û ji bo ku çareseriya siyasî cidî bixe rojev, divê qonaxê de pirtûkên "Destana Vejînê" û "Vejîn temam bû, dema rizgarbûnê hatiye" nivîsandin.

Lêgerînên Rêber Ocalan ên ji bo çareseriyê û pêşniyazên ji bo aştiyê bûn çend pirtûk. Ji van, "Çend hevdîtinên li gel Abdullah Ocalan", "Apo û PKK" , "Çend guftûgo li baxçeyê Kurdî de" , "Derbarê doza Kurd de li gel Ocalan û Burkay", "Li muxatebekî digerim- guftûgoya derbarê agirbestê de" û "Kuştina zilamtiyê"

Herwiha Rêber Ocalan pirtûkên bi navên "Pirsgirsêkên Şoreş û Sosyalîzmê" , "Di sosyalîzmê de Israr di mirovbûnê de Israr e" , "Ziman û Çalakiya Rastiyê", "Dîrok Di Roja Me De Veşartiye", "Çawa Bijîn 1- 2" û "Evîna Kurd" jî nivîsandine.

Pirtûk û manîfestoyên li Îmraliyê nivîsandî

Ji destpêka komploya navneteweyî û heta dîlgirtina Rêber Ocalan, ew guftûgo û bangên Rêber Ocalan di vê pêvajoyê de kirine, di pirtûka bi navê "Hêviya Aştiyê" de hatin belav kirin.

Pirtûkên Rêber Ocalan ên di çarçoveya Parêznameyê de jî ev in;

Parêznameya PKK'ê ji bo doza Rihayî: Pêşkêşî Dadgeha Rihayê hate kirin, lê di dadgehkirina Îmraliyê de nehate tomarkirin.

Ji bo Bersiva Pêwîst ji Dadgehkirina Îmralî û Dadgeha Mafê Mirovan a Ewrûpayê, Ji dewleta rahib a Sumer ber bi Şaristaniya Demokratîk ve 1-2.

Riha: Sembola Pîrozî û Nefretê, sala 2001'an hate belavkirin.

Mirovê Azad Nasnameya Rojhilata Navîn e: sala 2003'yan pêşkêş kir.

Parastina Gelekî: Di sala 2004'an de pêşkêşî Dadgeha Mafê Mirovan a Ewrûpayê kir û hate belavkirin.

Sala 2011'an Nexşeya Rê belav kir.

Manîfestoyên civaka demokratîk

Rêber Ocalan Manîfestoya Civaka Demokratîk a ji 5 bergan, pêşkêşî Dadgeha Mafê Mirovan a Ewrûpayê (DDME) kir.

Manîfestoya Civaka Demokratîk – Pirtûka 1 : Şaristanî (hezîran 2009)

Manîfestoya Civaka Demokratîk – Pirtûka 2 : Şaristaniya Kapîtalîst (hezîran 2009)

Manîfestoya Civaka Demokratîk – Pirtûka 3 : Sosyolojiya Azadiyê (tîrmeh 2009)

Manîfestoya Civaka Demokratîk – Pirtûka 4: Li Rojhilata Navîn Krîza Şaristaniyê û Çareseriya Şaristaniya Demokratîk

Manîfestoya Civaka Demokratîk – Pirtûka 5: Doza Kurd û Riya Çareseriya Demokratîk.

Herwiha hevdîtinên li Îmraliyê jî bi navê "Rizgariya Demorkatîk û Avakirina Jiyana Azad" hatin komkirin û weşandin.

Tezên wî bûn çavkanî

Pirtûk û tezên Rêber Ocalan, ji sînorên Kurdistanê û herêmê bihurîn. Ew gihîştine gelek welatên cîhanê. Heta niha herî kêm li 20 zimanên cuda yên weke Ingilîzî, Elmanî, Rûsî, Îtalî, Fransî, Spanî, Portugalî, Flamanî, Danîmarkî, Hindî, Swêdî, Yewnanî, Baskî, Koreyî, Fransî û Erebî hatine wergerandin.

Li gorî daneyê Însyatîfa Navneteweyî ya Azadî ji Ocalan re, li zanîngeh û navendên akademîk ên cîhanê herwiha li bernameyên xwendinê, pirtûkên Rêber Ocalan weke çavkanî tên bikaranîn. Ji bilî van, bi hezaran semîner û lêkolîn tezên Rêber Ocalan dibînin.

Oxford û Cambridge jî jê sûdê digirin

Herî zêde bi zimanê Ingilîzî derbarê Rêber Ocalan de lêkolîn û semîner hatine kirin. Li zanîngehên herî diyar ên Brîtanya yên weke Zanîngeha Oxfordê û Zanîngeha Cambridge jî sûd ji pirtûkên Rêber Ocalan tê girtin.

Li welatên ku pirtûkên Rêber Ocalan nehatine vegerandin, Înîsiyatîfa Navneteweyî ya Azadî ji Ocalan re, semîneran derbarê tezên Rêber Ocalan organîze dike. Weke welatên Emerîka Latîn, Başûrê Efrîka, welatên Îskandînavyayê û li Çînê.

***Ozgûr Polîtîka***

# Gelên bindest bi saya keda şehîdên xwe bûn xwedînasname

Dayîka Mihemed: Bila keyfa dijmin bi şehîdbûna ciwanên Kurd xweş nebe, heta mirinê wê tiliya me di çavê wan de be û emê di şopa şêhîdê xwe de bihêztir têkoşînê bikin.

**Jiyan Ebas-Qamişlo**




Ev 40 sal in gelê Kurd ji bo jiyaneke birûmet û rizgariya welatê xwe li hemberî dagîrkeran têkoşînê dike û di vê têkoşînê de berdêlên giranbiha hatine dayîn û hê jî tên dayîn. Zarokên agir û rojê bêdudilî canê xwe kirin fedayê azadiyê. Ji bo azadiya Kurdistanê, bi dehhezaran zaroyên Kurdan şehîd bûne û yek ji wan şehîd Mihemed e ku bi ruhê xwe yê şoreşgerî bû dengê welatê xwe.
Bi xwîna xwe xaka welat av dan. Ji giyanê xwe bihatir nedîtin ku bikin goriyê azadiya gelê xwe. 12 hezar şehîd û 25 hezar birîndar ji bo parastina welat giyan û parçeyên laşê xwe kirin qurban. Bi xwîna xwe jiyaneke azad û aram ji gelê xwe re afirandin. Çawa ku welat di dilê wan de bû, bîranîna wan jî di dil û wijdan gêlê wan de ye. Ji ber wê di vê raporê de em şehîd Mihemed bîr tînin, ku 9`ê Cotmeha 2021`ê bi êrîşên balafirên bêmirov yên dewleta Tirkan ya dagîrker, li taxa Hilêliyê ya bajarê Qamişlo şehîd bû û da dû şopa hevalên xwe.
Mihemed Gulo 16'ê Tebaxa 2000'an li bajarê Qamişlo, di malbateke welatperwer de ji dayîk dibe. Biçûkê dayîka xwe ye. Kesayeteke dilpak û jîr e. Ji zaroktiya xwe ve Tevgere Azadiya Kurdisatê nas dike û pir jê hes dike. Ji xwendina xwe jî pir hes dike, lê sala 2014`an ji ber nijadperestiya mamosteyên rejimê ya li dijî xwendekarên Kurd xwendinê di nîvî de dihêle û tevlî refên YPG dibe û 6 salan di nava şervanên YPG`ê de kar û xebatê dike. Amadekariya xwe dike ku bizewice, lê di rojeke reş ya dîroka bajarê Qamişlo de (9'ê Cotmeha 2021'ê) di êrîşeke balafirên bêmirov ya dewleta Tirkan ya faşîst de ew, kal û xalê (Yusif Gulo û Mazlum Gulo) xwe şehîd dikevin.
Dayîka şehîd Mihemed, Cîhan Gulo bi hestekî welatparêzî axivî û wiha behsa keseyeta kurê xwe kir: " Mirin tehl e, lê şehadet pîroz e. Şehadeta kurê min cihê serbilindiyê ye. Ez şehadeta wî li tevayiya gelê Kurd pîroz dikim. Mihemed kesayeteke civakî û devliken bû. Ji rastiyê hes dikir. Erê bi temenê xwe piçûk bû, lê bi mejî û fikrê xwe mezin bû. Di her qada jiyanê de cihê xwe çêdikir û cihê wî xuya bû. alîkariya her kesî dikir. Pir girêdayî hevalên xwe bû. Ez û wî weke du hevalan bi hev re bûn. Her dem di fikara hevalên xwe de bû. Dema temenê wî 14`e sal bûn tevlî refên YPG bû. Ev biryar ya wî bixwe bû û me jî bi kêfxweşî ev biryar qebûl kir. Piştî



ku tevlî kar û xwebata têkoşina azadiyê bû, bi hêza xwe û bi rihê xwe yê fedayî, tevlî gelek operasyona bû. Herwiha tevlî şerê Serê Kaniyê, Til Berak, Kobanê û Efrînê bû. Daxwaziya wî her tim ew bû ku di çeperên şer de bibe pêşeng. Çimkî pir dilgerim bû. Her tim digot, ez Bavê Şêro me, li hemberî dijmin nawestim.

**`Bila dijmin keyfxweş nebe, heta mirinê wê tiliya me di çavê wan de be`**

Dayîka şehîd Mihemd êrîşên dewleta Tirkiyê şermezar kirin û wiha axivî: "Ev êrîş ji hêla dewleteke faşîst û terorist ve tên kirin. Ev êrîş êrîşeke hovane bû her tim wê di dilê me de be, şehîdbûna kurê min ji min re birîneke bêderman e. Lê bila keyfa dijminan şehîdbûna zaroyên me neyê, heta mirinê wê tiliya me di çavê wan de be û emê li dû şopa şêhîdê xwe hê bihêztir têkoşînê bikin. Min soz da ku heta



dawiyê li dû şopa wî bim û kar û xebatê azadiyê bidomînim. Ez dengê xwe bilind dikim heta ku bigihe dawiya cîhanê. Şehîdên têkoşîna azadiyê namirin. Wê bi azadiya gelê xwe re her tim bijîn.
Herwiha birayê şehîd Mihemed, baran Gulo jî derbarê jiyana wî de wiha axivî: "Di malbatê de ez û Mihemed hevalên hev bûn. Malbatê bi giştî jê hes dikir. Kesayeteke bi evîn, aşitî û giyanê şoreşgerî dihat naskirin. Mihemed nayê jibîrkirin. Gotineke şehîd Mihemed hebû, her tim digot, 'divê mirov li vî welatî zengilek be'. Bi rastî jî di dawiyê de, bi çûna xwe ya birûmet bû zengilê vî welatî."

# Welatiyên Çemçemal, ji ber nebûna tûbên xazê bi agirû daran xwarinê çêdikin

**Tevî li navçeya Çemçemal ya Silêmaniyê, tûpên malan tê hilberîn û di warê xazê de dewlemend e, şêniyên wê ev hefteyek e nikarin betlek tûp bi dest bixin û diyar dikin ku ji ber nebûna tûpan, bi daran xwarina xwe çêdikin. Serokê Meclîsa Parêzgeha Silêmaniyê sedema kêmbûna tûpan ji aliyê welatiyan ve zêde bikaranîna wê dibîne.**

Ev demeke weke bajarên din ên Herêma Kurdistanê li navçeya Çemçemal a Silêmaniyê jî pirsgirêka kêmbûna tûpên malan heye. Lê rojane li heman navçeyê ji aliyê Kargeha Kormor re hezar tom tûpa malan tê hilberîn. Lê niha welatiyên navçeyê bê tûp in û nêzî hefteyekê ye li benda betlek tûpên malan e.
Welatiyê Çemçemalê Serdan Ezîz got: "Ev demeke mîna krîzên din, krîza tûpên malan jî ji bo welatiyan derketiye. Lê Çemçemal xwedî kargeha herî mezin a hilberîna gaza xwezayî ye. Me li niha taxê betlên xwe yên vala anîne li ber derî. Ev du roje tûpê me xelas bûye. Sibehê zû ve me peywendî bi tûpfiroş dikin, lê bersiva me nade. Eger betla tûpa me ji bo tîjekirinê bibin, divê çend rojan li bendê bimînin heta tînin. Li ber nebûna tûpên malan welatiyan serî li şewitandina daran daye. Eger ceyran hebe, hîterê bi kar tînin."
Ev çend roj in li Herêma Kurdistanê



pirsgirêka kêmbûna tûpên malan derketiye ku yek ji pêwîstiyên sereke yên welatiyane. Lê, hikûmeta Herêma Kurdistanê ji bo çareserkirinê xemsare û vê yekê ji bo welatiyên Herêma Kurdistanê bargiraniyek zêde çêkiriye.
Welatiya Çemçemal Nazdar Kerîm got: "Ev 4-5 roj in em li benda betlek tûp in. Ji ber nebûna tûpan, em nikarin bi tenorê nanî çêbikin. Neçar in nan bikirîn. Ji bo germkirin û xwarinê jî agiriyê



supeyê bi kar tînin."
Serokê Meclîa Parêzgeha Silêmaniyê Azad Hememîn red kir ku hilberîn û parvekirina tûpên malan kêm kirîne û got: "Agahiya me ji krîza tûpên malan heye. Hilberîna wê kêm nebûye. Li Silêmaniyê weke berê tê hilberîn ku 240 tone. Lê rêjeya wê weke xwesteka welatiyan nîne. Ji ber sedema kêmbûna neftê, xwesteka li ser bikaranîna tûpan zêde bûye. Ji ber zêdebikaranînê pirsgirêk derketiye."
Azad Hememîn diyar kir ku Wezareta Çavkaniyên Xwezayî soz daye di nava vê mehê de ji bo Silêmaniyê tûpên malan zêde bike û got: "Rojane hezar ton tûp li Kargeha Kormor tê hilberîn. Ji vê 700 tonan didin Herêma Kurdistanê û 300 tonan ji derveyî Herêma Kurdistanê diroş in. Em dixwazin ya Silêmaniyê zêde bikin. "
Li navçeya Çemçemal 6 kargehên tîjekirina betlên tûpên malan heye. 5 kargehan destûra fermî ya hikûmeta Herêma Kurdistanê heye û ser bi parêzgeha Silêmaniyê ne. Ya din jî destûra hikûmeta Iraqê heye û ser bi parêzgeha Kerkûkê ye.
***Rojnews***

# Dagîrkerê bi navê 'qeyûm' qirkirina ekolojiyê kiriye amanc

Endamê Komeleya Ekolojiyê Vahat Işikli, polîtîkayên ekolojiyê yên li Kurdistanê tên meşandin wek "qirkirin-mekan" bi nav kir û wiha got: "Bi destê 'qeyûman' (yên şaredariyên kurdan dagîr kirîn) ji giyayan bigire heta daran, ji rêyan bigire heta malan qirkirina ekolojiyê kirina amanc."
Endamê Komeleya Ekolojiyê Vahat Işikli, polîtîkayên ekolojiyê yên li Kurdistanê tên meşandin weke "qirkirin-mekan" bi nav kir û ev tişt got: "Bi destê qeyûman ji gihayan bigire heta daran, ji rêyan bigire heta malan qirkirina ekolojiyê tê hedefkirin."
Komeleya Ekolojiyê ku navenda wê li Amedê ye, der barê texrîbata xwezayî ya li Bakurê Kurdistanê de li avahiya xwe civîneke çapameniyê li dar xist. Di civînê de Endamê Komeleya Ekolojiyê Vahat Işikli axivî û bal kişand ser polîtîkayên ekolojiyê ku li Bakurê Kurdistanê tên meşandin. Işikli ku polîîkayên ekolojiyê yên li Kurdistanê tên meşandin weke "qirkirin-mekan" bi nav kir û ev tişt got: "Bi destê qeyûman ji gihayan bigire heta daran, ji rêyan bigire heta malan qirkirina ekolojiyê tê hedefkirin."
Iişikli da xuyakirin kir ku armanca qirkirina ekolojiyê ku li Kurdistanê tê kirin avakirina nasnameyeke nû ye!
***ANF***





# Li Hesekê qedexeya giştî ya 7 rojan hat ragihandin

Desteya Hundir ya Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê qedexeya 7 rojan ya giştî li ser kantona Hesekê û ya qismî li herêmên din yên rêveberiyê ragihand.

**Navenda Nûçeyan-Qamişlo**

Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê bi daxuyanyekê da zanîn ku ji ber êriş û tevgera DAIŞ'ê ji bo parastina ewlehiya herêmê qedexeya giştî li ser kantona Hesekê û ya qismî li ser herêmên din ên rêveberiyê radighîne.
Daxuyanî wiha ye:
"Dewleta Tirk ji bo pêkanîna armancên xwe yên têkbirina ewlehî û istîqrara Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi bin ket, ji ber vê yekê careke din berê xwe da DAIŞ`ê da ku armancên xwe yên qirêj ên têkbirina Rêveberiya Xweser û destkeftiyên wê, pêk bîne.
Lê berxwedana Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) û Hêzên Ewlekariya Hundirîn ya lehengane, ev êrîşa li dijî gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê û pêkhateyên wê têk bir û armanca dewleta Tirk a dagirker vala derxist. Dewleta Tirk bi vê hewldana xwe careke din îsbat kir ku ew mastermîndê (aqlê birêvebirinê) yê DAIŞ`ê ye ku ew xeteriyeke mezin li ser ewlehiya herêmê û cîhanê çêdike.
Em weke Desteya Hundirîn a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê qedexeya giştî ya hundirîn û derve a heya hefteyekê li ser bajarê Hesekê radigihînin. Qedexe ji 24`ê Çile dest pê dike heya 31`ê Çile. Qedexe giştî ye, tenê saziyên xizmetguzariyê yên wekî (Firne, aş, navendên tenduristiyê, sotemenî û şaredarî) ku xwezaya karên wan cuda ye, wê bixebitin. Her wiha li sazî û bajarên din jî qedexeya beşî(qismî) ye û ji saet 06:00`ê êvarê dest pê dike heya 06:00`ê sibehê.
Di dema qedexeyê de tevgera çûn û hatina di navbera bajaran de jî qedexe ye. Ji bo parastina ewlehiyê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê em ji gelê xwe dixwazin ku papendî van perspektîfan bin, da ku hêzên me karibin bi erka xwe ya parastina ewlehî û istîqrara herêmê rabin. Em ji hêzên xwe re serkeftina domdar dixwazin. "

# 'Rejima Sûriyê bi gotinên şovenîst û bêaqilî êrişî hêzên ku li dijî DAIŞ'ê şer dikin, dike'

**Navenda Nûçeyan-Qamişlo**

Daîreya Têkiliyên Derve ya Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê bersiva daxuyaniyên hikumeta Şamê yên têkildarî bûyerên dawî yên li Hesekê da. Daxuyaniyên wezareta rejîmê û Fesysel Miqdad, şovenist û pêkenok in.
FacebookTwitterWhatsAppTelegram
Wezareta Derve ya hikumeta Şamê li ser êrişên çeteyên DAIŞ'ê yên li ser girtîgeha Sînaa ya girtiyên DAIŞ'ê ya bajarê Hesekê daxuyanî dabû. Wezaretê berxwedana QSD'ê ya li hemberî van êrişan bi sûcên şer bi nav kiribû û ji bo êrişên çeteyên DAIŞ'ê wek berxwedan pênase kiribû.
Têkildarî vê daxuyaniya beradeyî, Daîreya Têkiliyên Derve ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê daxuyaniyek da.
Daxuyaniya wiha ye:
"Ev deh sal e û aloziya Sûriyê gûrtir dibe. Rejîma Sûriyê berpirsyartiya herî mezin ji rewşa mirovî, siyasî û aborî ya xirab a Sûriyê ye wergirtiye, ji tevgera koçberî û penabertiyê ku gelê Sûriyê bi tevahî pêkhateyên wê pê re rû bi rû ma, erdîngariya wê, her wiha binsaziya ku hate wêrankirin, dagirkirina beşin ji xaka Sûriyê ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve. Ji ber van bûyeran hewcedarî bi helwest û berpirsyariyên zêdetir hebû.
Em dibînin ku rejîma Sûriyê bi gotinên şovenîzm û bêaqilî êrişî hêzên ku li dijî terorê şer dikin, dike, QSD bi taybetiyên nelayîq bi nav dike. Ev yek zihniyeta wê şîrove dike ku bi vê zihniyetê desthilata xwe ya despotîk bi rêve dibe. Rejîm têkildarî êrişên li ser girtîgeha Xiwêran a li Hesekê ya ku bi hezaran DAIŞ'ê dihewîne, dibêje ku berxwedana li dijî terorîstan(DAIŞ'ê) sûcê şer e. Di sala 2015'an de rejîm û artêşa wê li hember êrişên 100 terorîstan, ji vê girtîgehê reviyan. Di wê demê de girtîgeh ji aliyê Yekîneyên Parastina Gel û Yekîneyên Parastina Jin ve hate rizgarkirin. Daxuyaniyên wezareta rejîmê û Fesysel Miqdad, pêkenok in. Diviyabû ku rejîm bûyerên ku îro li Sûriyê diqewime, sûcên ku di nava 10 salan de rû dane, qetilkirin û koçberkirina sivîlan bipirse. Xwezî ev daxuyaniyên wezareta derve ya rejîmê ji bingehê Sûrî be! Ji bîr kiriye ku Hesekê bajarekî Sûrî ye û yên ku li dijî DAIŞ'ê şer dikin, zarokên Sûrî ne. Lê wisa xuya ye ku tercîha DAIŞ'ê weke rêgezekê ji bo rewakirina têkçûna rejîmê di diyalogên bi Rêveberiya Xweser re û serkeftina wê di serweriya li herêmê de, îro ji her axaftineke erênî li ser hewldan û berxwedana ku li Hesekê tê kirin tê qebûlkirin. Di demekê de ku em van daxuyaniyên ne berpirsyar şermezar dikin, em dixwazin bînin bîra xwediyên wê ku DAIŞ'ê rûbereke fireh ji Sûriyê dagir kir û ne ji berxwedan û fedekariyên gelê me bûye di aliyê leşkerî de lawaz nedibû. Diviyabû ku wezareta derve ya rejîmê di rêgirtina li ber kiryarên Tirkiyê û dagirkirina wê ya li Sûriyê û kiryarên çeteyên wê de, rola xwe di asta Konseya Ewlekariyê û Neteweyên Yekbûyî de bilîsta. Ev daxuyanî moralekî mezin dide DAIŞ û Tirkiyê ya dagirkirî ya ku rasterast destekî didin kiryarên terorîstên li girîgeha Xiwêran.
Em Daîreya Têkiliyên Derve ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, bang li hikumeta Şamê dikin ku baş bifikire, ji xewê şiyar bibe, baş bizanibe ku hemû plan û gotinên wê êdî bêfêde ne û tu kes romanên wê bawer nake. Divê dev ji xîtab, xiyanet û wêrankirin berde bi kêmanî bêyî li xwe vegerê."

# Çalakiya konvedanê ya li ber deriyê Sêmalka hat bidawîkirin

**Navenda Nûçeyan-Qamişlo**

**Çalakiya Konvedanê ya ji aliyê Malbatên şehîdan ya ku li ber deriyê Sêîmalka hatibû lidarxistin, îro hat bidawîkirin. Lê ji bo wergiritina cenazeyên şehîdan û piştgiriya berxwedana gerîla wê çalakiyên bi şêwazên cûda werin lidarxistin.**

Berîya 4 mehan 6 gerilayên azadiya Kurdistanê dema ku li Xelîfanê dixwazin derbazbin, pêşmergeyên PDK'ê wan dixin keminê û ji wan gerillayan tinê yek xilas dibe, her pêncên din şehit dikevin. Piştî şahadeta van şervanên azadiyê PDK'ê vê care dest didanî ser cenazeyê wan û teslimî malbatên wa nakir. Li hember van kiryarên PDKê yên dijminahiya gelê kurd dike, li deriyê Sêmalka malbatên şehîdan ku cenazeyên xwe bigrin çalekiya konvedanê destpê kir. Ev çalekiye nizî 4 mehan berdewam kir, lê PDK ne ji hevkariya xwe ya bi dijminê kurd re hat xwarê nejî cenaze teslimî malbatan kir. Bi bahaneya vê çalekiyê derîyê Sêmalka li ser gelê bakur û rojhilatê Sûrî girt.
Ji bo bidawîkirina çalakiya Konvedanê saziya malbatên şehîdan li Sêmalka daxuyaniyek da.



**Daxuyanî wiha ye:**
"Nêzî 4 meh in ji bo ku em cenazeyên zarokên xwe Tolhildan Raman û Serdem Cûdî yên ku li gundê Bêxmê yê girêdayî Xelîfan li başûrê Kurdistanê bi destê çekdarên PDK şehîd bûne wergerin, Me li vir çalakî dest pê kir.
Tevê hemû bangewazî û daxwazên me ji rayedarên Partiya Demokratîk ya Kurdistanê ku cenazeyên zarokên me yên şehîd radest bikin, lê me tu bersiv wernegirtin.
Çalakiya me çalakiyeke însanî, rawa û mafdar e. mafê her dayîk û bavekî heye ku cenazeyên zarokên xwe bigrin. Emê têkoşîna xwe bidomînin.
Em îro çalakiya xwe li Sêmalka bi dawî dikin, lê belê emê bi şêwazekî nû û li cihên cûda çalakî û têkoşêna xwe bidomînin.
Em tevayiya dost, welatparêz û saziyên ku heya vê rojê serdana me kirin û piştgiriya xwe raber kirin, spas û silav dikin. Herwiha ji wan daxwaz dikin ku heya em bigihijin armanca xwe piştgiriya me bikin.



# Dagîrkeran hê serkeftina Kobanê û şkestina DAIŞ`ê qebûl nekirine

Kobanê berxwedana li hemberî DAIŞ'ê, ji çarçoveya bajarekî derxist û ji bo gelê Kurd bû rûmet û hebûn. Dewleta tirkî ya dagîrker jî bi êrişên bênavber dixwaze DAIŞ'ê jinûve zindî bike, vîna gelên herêmê û pergala Netewya Demokartîk bişkîne.

**Serbest Etê/Qamişlo**



**Êrişên çeteyên Tirkiyê**

Sala 2014`an Sûriye ber bi tarîtiyê ve diçû. Lewra hêzên çekdar yên qaşo li dijî Hikumeta Şamê bi tevayî ji aliyê dewleta tirkî ya dagîrker ve hatin kontrolkirin. Ev çete, bi awayekî eşkere ji bo xizmeta projeyên dewleta tirkî ya dagîrker hatin bikaranîn.

Tirkiye bi riya çeteyên El-Nusra, Ehrar El-Şam û DAIŞ`ê sala 2012`an êrişî Efrîn, taxên Şêxmeqsûd û Eşerfiyê kir. Di heman demê de êrişî Serê Kaniyê (8`ê Mijdara 2012, Çile û Îlona 2013`an) kir. Tirkiyê bi serkêşiya Erdogan û bi riya van çeteyan li seranserê sînorê Rojava ji Tilkoçer (27ê Cotmeha 2013'an) ku ji DAIŞ û EL-Nusra hatibû rizgarkirin heta Efrînê bênavber êriş dikir û hewl dida Rêveberiya Xweser bişkîne. Lê bi ser neket.

**Bi êrişa ser Kobanê xwestin derbeke siyasî û leşkerî li şoreşa Rojava bixin**

Di serî de dewleta tirkî ya dagîrker, hin hêzên herêmî û yên navneteweyî ji bo belavbûn û dagîrkirina herêmê, ji DAIŞ`ê re atmosefreke guncaw ava kirin. Di nava çend rojan de artêşa Şam û Bexdayê sala 2014`an herêmên fireh û bajarên mezin (Reqa û Mûsil) bêşer radestî DAIŞ`ê kirin. Di encamê de gelek cebilxane û çekên giran ketin destê çeteyên DAIŞê. Piştî wê êrişên li ser Xweseriya Demokartîk û gelê Kurd ketin rewşeke din.

Kobanê wê demê hem ji milê Girê Spî, hem ji milê Sirîn, hem ji milê başûr ve ji aliyê çeteyên DAIŞ`ê ve dorpêçkirî bû. 15ê Îlona 2014an DAIŞê bi dehhezaran çekdarên



xwedîezmûnên leşkerî -yên berê li Efxanistan û Iraq şer kirîn ku di sînorê Tirkiyê re derbasî Sûriyê bûbûn- û bi dehan tankên ji artêşa Sûrî û Iraqê standîn êrişî Kobanê kirin. Bi vê êrişê, armanca Tirkiyê û DAIŞê ew bû ku bajarê şoreşa 19ê Tîrmehê jê dest pê kirî dagîr bikin û derbeke siyasî û leşkerî li Rêveberiya Xweser bidin û pêşiya têkçûna DAIŞ'ê bigirin. Li gorî serçeteyekî DAIŞ`î -ku 2017an ji aliyê QSDê ve hat girtin- jimara çeteyên DAIŞ`ê li Sûriye û Iraqê dema êrişa ser Kobanê gihîştibû 300 hezarî.

**Berxwedana Kobanê bû Hêviya cîhanê ku ji DAIŞê xilas bibe**

Li dijî vê hovîtiya mezin, hişmendiya qirkirinê û çekên giran yê DAIŞ'ê, şervanên YPG-YPJ'ê û gelê Kobanê bi vîneke azad û bi çekên sivik pêşengiya berxwedana dîrokî kirin û şerê têkbirina DAIŞ'ê li Kobanê dest pê kirin. Berxwedana Kobanê nîşanî cîhanê da ku şervanên azadiyê dikarin serkeftinên mezin li dijî komên herî dijwar bi dest bixin. Kobanê bi qasî ku bû sembola berxwedanê, ruhê yekîtiya gelê Kurd ya neteweyî jî zindî kir. Lewra ji çar aliyên Kurdistanê, ciwanên Kurd mîna lehiyê berê xwe dan wargeha berxwedanê. Vê berxwedana dîrokî, wisa kir ku çavê cîhanê bê ser Kobanê û bibe çavkaniya cîhanê ya hêviya xelasiya ji DAIŞê. Ji ber wê 1`ê Mijdara 2014`an Roja Cîhanî ya piştgiriya Kobanê hat ragihandin û wêneyên şervanên azadiyê li kolanên bajarên herî mezin yên cîhanê hatin daliqandin. Têkçûna DAIŞ li Kobanê, kilîta têkbirina DAIŞ`ê



xist destê şervanên azadiyê û Adara 2019`an li Baxoza Dêrazorê di aliyê erdnîgarî de ji holê rakirin.

**Kobanê ji dijmin û dostan re teqez kir ku çeka herî xurt û serkeftî, vîna azad ya gelan e.**

Piştî derbasbûna ewqas dem ser têkçûna DAIŞê re, Kobanê hê rastî êrişan tê. Vê carê êrişkar ne DAIŞ e, çêkera wê dewleta tirkî ya dagîrker e. Gelo çima Kobanê?

Kobanê bajarê yekê bû ku Rêber Apo derbasî wê bû û li Rojava himbêza xwe ji Tevgera Azadiyê re vekir. Bi vê jî bû dergehê tevlîbûna gelê Rojava ya Şoreşa Azadiyê. Herwisa xwediya çirûska yekê ya şoreşa 19`ê Tîrmeha 2012an bû. Bi berxwedana xwe ya li hemberî DAIŞ`ê hat naskirin. Şoreşa Rojava û projeya Rêveberiya Xweser wek projeyeke serkeftî bi cîhanê da nasîn. Li hemberî êrişên çeteyên DAIŞ'ê -ku artêşên dewletên mezin li pêşiyê serî danîn û reviyan- Kobanê serî dananî û şkand. Têkçûna DAIŞ`ê li Kobanê, riya têkoşîna azadiyê nîşanî mirovayiyê kir. Kobanê ji gelê Kurd û azadîxwazan re ji çarçoveya bajarekî derket û bû rûmet û dîrok. Kobanê ji dijmin û dostan re teqez kir ku çeka herî xurt û serkeftî, vîna azad ya gelan e.

**Ji ber ku vîna gelan ya azad bi ser ket, dagîrker vê qebûl nakin**

DAIŞ projeyeke dewleta tirkî ya dagîrker bû û bi belgeyan ev hat teqezkrin. Tirkiye di sînorê xwe yê başûr yê bi Sûriyê re bi dehhezaran çete, alav û pêdiviyên leşkerî derbas kirin û çete li ser erdê xwe perwerde kirin. Lê ji ber berjewendiyên qirêj yên hêzên navnetweyî helwesteke pir şermoke derket.

Binketina DAIŞ`ê wek binketina dewleta tirkî ya dagîrker tê hesibandin. Ji ber wê dixwaze hem bi êrişên xwe yên bi balafir, tank û topan hem bi zindîkirin DAIŞ`ê tola xwe ji Kobanê hilîne. Dixwaze vîna azad ya gelan û projeya Rêveberiya Xweser di kesayeta Kobanê de bişkîne. Projeya wê ew e ku gelê wê bide koçberkirin. Lê gelê Kurd rûmeta xwe ji bîr nake û weke ku li hemberî DAIŞ`ê serî dananî, wê li hemberî êrişên dewleta faşîst ya tirkî jî daneyne.





Girtîgeha xwêran.....derba nekuje bihêztir dike

**Dilyar Cizîrî**

Pêşiyên Kurdan dibêjin, derba te nekuje te bihêz dike. Li ser plana êrişa li dijî girtîgeha Hesekê ev gotin, cih digre. Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku li ser sêleke sor şûneke cemidî afirand û jiyana bi milyonan welatiyên ji hemû pêkhateyan parastiye, ne li xweşiya dewleta Tirk, Hikûmeta Şamê, Rûsiya û Îranê ne. Ev hêzên behsa mijarê di meydanê de xwedî proje ne, Rêveberiya Xweser û serkeftina wê hemû planên wan vala derdixe. Di serî de jî ev yek ji bo dewleta Tirk derbasdar e.

Ji lewma bi hêz û planeke mezin êrişa girtîgeha Xwêran a Hesekê ku bi hezaran girtiyên DAIŞ'ê tê de hatine bi cihkirin, kirin. Di serî de dewleta Tirk bi vê planê armanc dikir, dena Hesekê bikeve destê DAIŞ'ê, bi behaneya ewlekariya xwe wê ji milê Til Temir û Êyn Îsan êrîşeke berfireh daba destpêkirin. Tişta vê rastiyê isbat dike jî, di roja êrişî de ji saetên sibê ve dewleta Tirk hejmara çeteyên xwe yên li gundên dagirkirî yên nêzî Til Temir zêde kirin. Heman tişt li derdora Ên Îsa jî hatibû kirin. Ji xwe li Eyn Îsa êrîşeke dijwar hate kirin.

Hikûmeta Şamê, ku çarkoşeya wê ya Ewlekarî li nava bajarê Hesekê heye, hêzên wê tenê di navbera 1-2 kîlometr dûrî girtîgeha Xwêran in. Armanca wê ji ew e bi vê êrîşê para xwe ji Hesekê û herêmên din bigre. Tişta vê rastiyê jî isbat dike, welatiyên Hesekê dîtin, roja êrişa DAIŞ'ê ji saetên sibê ve leşkerên hikûmeta Şamê di nava liv û tevgerê de bûn û bendên xwe bi hêz kiribûn.

Ne tenê wiha lê belê agahî belav bûn ku hejmarek çeteyên Insar El-Emin El-Eskerî (çete ne girêdayî rêjîma Baas in) winda bibûn. Ew ne windane, ya rast wan jî cihê xwe di êrişê de girtin.

Di vê hevkariya dewleta Tirk û hikûmeta Şamê de, rola navbênkar a Rûsiya ye. Wê li gorî berjewendiyên xwe herêmên Rêveberiya Xweser di navbera hardû aliyan de par ve bike. Yenî Rûsiya jî beşekî sereke yê vê plana qirêj e. Istxbaratên hersê welatan plan ji êrişa Girtîgeha Xwêran a Hesekê dan destpêkirin. Tişta van xalan piştrast dike jî, ragîhandinên hersî welatan bi êrişê re ketin dewrê û dest bi reşkirina hêzên QSD'ê kirin.

Rola Amerîka û Koalîsyona Navdewletî jî di vê êrişê de ew e ku heta niha bi awayekî cihî beranberî rewşa metirsîdar a girtîgeh û kampên girtiyên DAIŞ'ê û malbatên wan erka xwe pêk neanîne. Tevî baş dizanin, dewleta Tirk û çeteyên girêdayî wê ji Serêkaniyê û Girê Spî şaneyên DAIŞ'ê fînase û perwede dikin. Lê carde jî wekî teyrê Neama serê xwe kirine axê û ji bo berjewendiyên xwe naxwaz in vê rastiyê bibînin.

Şervanên QSD'ê û hêzên Asayîşê û li pişt wan gelê Hesekê hejmarek mezin şehîd û birîndar dan û plan vala derxistin. Bê guman valaderxistina vê planê wê wiha neçe, wê rewş piştî êrişa girtîgeha Hesekê ne wekî beriya wê be. Têkçûna planê wê di navbera şirkên dijber Rûsiya, Tirkiyê û Hikûmeta Şamê de nakokyan zêdetir bike. Di heman demê de Amerîka û kolaîsyona Navdewletî ji niha û şûn ve wê mecbûr be hinekî be jî erka xwe ya beranberî dosya DAIŞ'ê bi cih bîne. Ji bo wê jî wê mecbûr bibin piştgiriya xwe ya bi Rêveberiya Xweser de zêde bike. Encamên wê ji niha bi vekirina deriyê Fîşxabûr (Sêmalka) re diyar dibe.



# `Li pişt êrişa DAIŞ`ê Tirkiye heye`

**Ferhan Dawid: Dewleta tirkî nikarî bi êrişan hêza me bişkîne. Ji bo wê dixwaze DAIŞ'ê jinûve zindî bike û bi destê çeteyan gel qir bike. Amerîka û Rûsya jî qaşo ji bo şerê DAIŞ'ê hatine bakur û rojhilatê Sûriyê, lê mixabin heta niha erkê xwe pêk neanîne û li dû berjewendiyên xwe ne.**

**Darîn Silê/Qamişlo**

Dewleta Tirkî ya dagîrker dixwaze careke din li bakur û rojhilatê Sûriyê DAIŞ`ê zindî bike. Herî dawî bi piştgiriya wê çeteyan êrişî girtîgeha Xiwêran ya Hesekê kirin û xwestin li herêmê gel bitirsînin û tevlîheviyê derxin.



Derbarê mijarê de Hevserokê Ofîsa Rêxistinkirinê ya Tev-Dem Ferhan Dawid da zanîn ku Tirkiye dixwaze bi riya çeteyên DAIŞê herêmê bixe binê bandora xwe û axaftina xwe wiha domand: "Dewleta tirkî bi tevayiya hêz û hewldanên xwe dixwaze îradeya gelê Kurd bişkîne û Rêveberiya Xweser ji holê rake. Herwiha naxwaze fikirê demokratîk di nava gel de belav bibe. Berî niha jî çiqas hewl da ku me tine bike lê nikarîbû. Ji ber wê çeteyên DAIŞ'ê yên veşartî bi kar anîn û xwest êrişî bajarê Hesekê bike. Bi taybetî girtîgeha Sînaa ku nêzî 3 hezar û 800î çete tê de ne. Jixwe her kes dizane ku ev girtîgeh weke bombeyekê li Hesekê ye. Eger biteqe wê xetereke mezin li ser bakur û rojhilatê Sûriyê çêke."

Ferhan got, li cîhanê alîgira sereke ya DAIŞê dewleta tirkî ye û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Ji destpêkê heta niha baş xuya ye ku, ya serkêşiya DAIŞê dike dewleta tirkî ye. Herwiha Tirkiye wan perwerde dike û derfetê dide ku derbasî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê bibin û êrişî gelê herêmê bikin. Ji ber ku êrişên dewleta tirkî li herêmên me şikestin, dixwaze careke din DAIŞ'ê zindî bike û gelê bakur û rojhilatê Sûrî bixe tehlûkê û wan koçber bike."



**`Xuya ye ku her tişt plankirî ye`**

Ferhan da xuyakirin ku armanc ne girtîgeha Xiwêran tenê ye û ev li axaftina xwe zêde kir: "Rast e girtîgeha Hesekê bû amanc, lê amanc ne Hesekê tenê bû. Armanc ew e ku DAIŞ'iyên zindanê di nava herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê de belav bikin û şerekî dijwar bidin derxistin. Êrişa vê dawiyê çêbûyî diyar e ku berî niha hatiye plankirin. Çimkî her kes dizane ku ev girtîgeh bi rengekî baş dihat kontrolkirin û ti kesî nikariya ji hundirê wê bireve. Lê ne di hundirê wê de li derveyî wê hazirî hatibû kirin û çekên giran ji çeteyan re hatibûn peydakirin. Xuya ye ku tev ji milê Tirkiyê ve hatine amadekirin. Lewra dema bûyer qewimî Tirkiyê ji aliyekî din ve êrişî Til Temir, Eyn Îsa û Şingalê kir. Xuya ye ku her tişt plankirî ye. Lê tevî ewqas hazirî û planan armanca Tirkiyê bi ser neket. Çimkî hêzên parastinê berxwedaneke mezin kirin û rewş kontrol kirin. Hin çete li derdora girtîgehê mane lê ew jî dorpêçkirî ne û wê di demekê kurt de bên kontrolkirin."



**`Hêzên qaşo ji bo tinekirina DAIŞ'ê li vir bêdeng in!`**

Ferhan diyar kir ku Amerîka û Rûsya li hemberî kiryarên DAIŞê bêdeng in û wiha got: "Amerîka û Rûsya jî qaşo ji bo şerê DAIŞ'ê hatine bakur û rojhilatê Sûriyê. Lê mixabin heta niha her duyan jî erkê xwe pêk neaniye û li du berjewendiyên xwe ne. Jixwe Rûsya li planan digere ku Rêveberiya Xweser ji holê rake. Bûyera li Hesekê qewimî eger hêzên YPG û YPJê kontrol nekiribûna wê li her derê feleker çêbûya. Herwiha wê 'çeteyên razayî' li her derê derketana, bi taybet li milê hol û Şedadê. Ji bo wê jî divê Amerîka û Rûsya di van bûyeran de rola xwe bilîzin û bi cidiyet nêz bibin. Çimkî heta niha ne Rûsya ne jî Amerîka li ser mijara DAIŞê nesekinîne. Ma emê heta kengê çeteyên walatên derve xwedî bikin. Rast e Rêveberiya Xweser erkê xwe yê mirovî dike û van çeteyan di li girtîgehê dihewîne, lê divê êdî her walat li çeteyên xwe xwedî derkeve û em ji van çetan xilas bibin. Em her tim bang li hêzên navneteweyî dikin ku vê pirsgirêkê çareser bikin. Eger welat çeteyên xwe bibin wê gel bixwe aloziya walatê xwe çareser bike û ev hêza gel û rêveberiya wê heye. Lê mixabin ti kes li vê pirsgirêkê xwedî dernakeve û naxwazin ev pirsgirik çareser bibe. Ji bo wê jî divê hêzên ku li vir weke Amerîka û Rûsya despêkê li erkê xwe xwedî derkevin. Çimkî eger rewş wiha dewam bike wê alozî dewam bike û belavî cîhanê jî bibe."

Hevserokê Ofîsa Rêxistinkirinê ya Tev-Dem'ê Ferhan Dawid di dawiya axaftina xwe de bang li gelê Kurd kir ku erkê xwe pêk bînin got, dijminê me dijminekî hov e, bi hovîtî êrişî me dike û dixwaze me tine bike. Ji bo wê divê gel şiyar be û berxwedana xwe xurt bike.

## DAIŞ belavkirina wêrankirin û tariyê didomîne



**Zekî Bedran**

DAIŞ'ê êvara 20 vê mehê êrişî girtîgeha Hesekê kir. Li vê girtîgehê bi hezaran DAIŞ'î hene. Dihat zanîn ku girtîgeh amanc e. Berî niha bi hêzên koalisyonê re pêşiya êrişan hatibû gitin. Mehên borî hewldanên wiha di rojevê de bûn. Yên amadekariya êrişê dikirin hin hatinbûn girtin û hin jê hatibûn kuştin. DAIŞ careke din dixwaze xwe komî ser hev bike û derkeve meydanê. Li Baxozê şkestibû herêmên di destê xwe de tev winda kiribûn. Xwest hêzên xwe yên mayîn biparêze û dest bi xebata bi dizî kiribû. Ev demek bû bi kuştina mirovan li hin devaran dixwestin gel bêdeng bikin û propagandaya xwe dikirin. Di navbera Iraq û Sûriyê de ji bo parastina xwe cî dîtin. Sûriye û Iraqê nikarîn li wan herêman serdest bibin. Carna jî êrişî leşkerên Sûriyê dikirin.

Êrişa 20ê mehê parçeyeke ji planeke berfireh xuya dike. Di heman rojan de li Iraqê jî êrişî hêzên leşkerî kirin. DAIŞ, digel ku li dinyayê hatiye naskirin û tevlî her rengê sûcên dermirovî bûye di hişmendiya xwe de ti guhertin çênekirin. Ji nakokî û lewaziya ewlakariyê yên li herêmê sûd girt. Li aliyê din dagîrkirina beşeke girîng ya erdê Sûriyê ji aliyê Tirkiyê ve ji bo DAIŞ'ê herêmeke dinya ewle afirand. DAIŞ bi istixbarata tirkî û hêzên wê yên leşkerî re xebitî. Tirkiye li hemberî Kurdan û Rêveberiya Xweser her dem bi DAIŞ'ê re di nava itîfaqê de bû. DAIŞ'î li wan herêman bi hêsanî bi cî bûn û xebitîn. Êrişa li Hesekê jî di navê de gelek êrişan piştgiriya xwe ji wan herêman girt.

Piştî êrişa DAIŞ'ê dewleta tirkî êrişî herêma Eyn Îsa kir. Du sivîl şehîd, çar jî birîndar bûn. Hin çete jî hatin kuştin. Ji Til Temir û herêmên din jî êriş çêbûn û bi hezaran çekdar şandin herêma. Bi êrişa DAIŞ'ê re ev êriş çêbûn. Dewleta tirkî dibêje, çi dibe bila bibe divê rêveberiyên xweser bên tinekirin. Pir dixwaze bibe cîran û şirîka DAIŞ'ê. Dema herêmên sînor di destê DAIŞ'ê de dewleta tirkî qet nerihet nedibû. Çi dema ku DAIŞ hi herêmê hat derxistin Tirkan di cî de sînor girtin. Berî hingê Koalisyonê çiqas hewl da jî nikarî sînor bi Tirkan bide girtin. Vê rewşê herî zêde nûnerê Amerîka yê Sûriyê Brett McGurk vê rewşê dizane.

Li hemberî Kurdan û rêveberiyên xweser ya herî zêde dijminiyê dike dewleta tirkî ye. Par mehên dawî ji bo dagîrkirina herêmên nû bi awayekî eşkere ket tevgerê. Ji bo wê bi Amerîka û Rûsya re ket nava bazarê. Ev bazar hê dewam dike. Ji bo ku destûr negirtine nayê wê wateyê wê bisekinin. Bi rengên cuda şer didomîne û êrişan organîze dike. Di rojên dawî yên salê de bi balafiran li Kobanê komek ciwan şehîd xistin. Li seranserê sînor êriş û bombebaranê dewm kir. Niha jî bi DAIŞ'ê re êriş pirtir kirin.

Şansê DAIŞê nîne ku encamê ji van êrişan bigire. Eger hêzên weke Tirkiyê destekê nedinê wê qada wê ya tevgerê teng bibe. Eger Iraq, Sûriye û QSD bi kordîne bixebitin wê DAIŞ nikaribe tev bigere. Halê hazir DAIŞ êrişî van hêzan tevan dike. Lê ev hêz bi hev re hereket nakin. Rêveberiya Şamê jî DAIŞ'ê dijmin dibîne lê dema êrişî Hesekê kirin lê temaşe kirin. Heta dixwaze DAIŞ êriş bike da li rêveberiyên xweser tevlîhevî derkeve. Yên li Şamê rûdinin wisa dizanin ku rêveberiyên xweser lewaz bibin wê ji bo wan baş be. Halbiku Rêveberiyên xweser weke DAIŞ'ê dijminiya yên li Şamê nakin. Tersê wê dixwezin bi Şamê re li hev werin.

Ji bo bêbandorkirina DAIŞ'ê hêzên koalisyênê li Hesekê bi QSD'ê re xebitî. Bi keşif û desteka qada hewayî di bêbandorkirina DAIŞ'ê de roleke çalak lîst. Lê ev nayê wê wateyê ku pirsgirêka DAIŞ'ê çareser bû û xeter ji holê rabû. Eger koalisyon li hemberî hevkariya dewleta tirkî ya bi DAIŞ'ê re nebe xwediya helwesteke cidî, wê xeter dewam bike.

Gelên bakur û rojhilatê Sûriyê li hemberî DAIŞ'ê û çeteyên din berdêlên pir giran dan. Li herêmên rizgar kirîn sîstemeke demokratîk ava kirin. Niha ev nirx û destkeftî bûne amanc. Ji bo wê divê gel li hemberî DAIŞ'ê û piştgirên wê li têkoşînê xwedî derkeve. Divê li hemberî hewldanên tevlîheviyê û propagandaya reşkirinê rawestin û bi biryardarî berxwedanê bidomînin. Çawa ku berxwedana deh salan, berdêlên giran û destkeftî tinebin dixwazin li ser her tiştî rûnin. Divê gel vî welatî dev bi dagîerkeran û çeteyên dijminên mirovayiyê ve bernede.